

Şîreta bikaranînê Dîyarkera dokelê RM 680110



I. Signalên piraktîk û hişyarker di nêrînekê

<p>))) Forte segnale acustico di allarme ogni 2 secondi</p> <p>✱ Il LED lampeggia 1 volta ogni 2 secondi</p>		<p>Zenga hişyarîyê</p>
<p>))) Segnale acustico di allarme debole 3 volte ogni 5 minuti</p> <p>✱ Il LED lampeggia 1 volta ogni 5 secondi</p>		<p>Alozî di kiryarrê</p>
<p>))) Segnale acustico di allarme debole 2 volte ogni 10 minuti</p> <p>✱ Il LED lampeggia 2 volte ogni 30 secondi</p>		<p>Kontrola navberê</p>
<p>))) Segnale acustico di allarme debole 3 volte ogni 15 minuti</p> <p>✱ Il LED lampeggia 3 volte ogni 15 minuti</p>		<p>Naskirina cûdabûna ji soketê</p>
<p>))) Segnale acustico di controllo (volume ridotto)</p> <p>✱ Il LED lampeggia simultaneamente al segnale acustico di controllo</p>		<p>Taqîya Piraktîkî</p>
<p>✱ Nessun segnale acustico</p> <p>✱ Il LED non lampeggia</p>		<p>OK Piraktîka Normal</p>

II. Şirovekirin



Zenga hişyarîyê

Keremaxwe serdana beşa V. biken – xebatên dema şewat (serdana rûpela piştê biken). Eger dengê zenga hişyarîyê bê dikarin pê bişkovka taqîyê dîyarkera dokela RM 680110 ê bitemirînin. Ronîya LED yê her 2 çikeyan carekê berdwam dibe. Eger paş 15 xûlekan pîrsgirêk çareser nebe, zenga hişyarîyê tê nû destpêbike.

Zenga hişyarîyê ku şaş lê dide, divê çi jê biken

Toza çê kirinê, av yan hilima çêkirina xwarinê dikare zenga hişyarîyê şaş lê bide (dengê bilind yê pîpê). Zenga hişyarîyê ku

şaş lê dide, dikarin pê givişîna bişkovka taqîyê bitemirînin. Bilez lêkolîn biken ka hewa bi başî diodeyê da dimeşe. Eger zenga hişyarîyê herwisa berdwam bû, bişkovka taqîyê pêlken. Bo baldarî, çîranê xwe agadar biken ku ji ber zenga hişyarîya şaş gel agirîkûjê pêwendîyê negirin.

Divê gel zengên hişyarîyên ku şaşin, çi jê biken

Zenga hişyarîyê ku şaş lê dide (zenga hişyarîya bilind ku bê hecê dengê vê tê), dikarin pê givişîna bişkovka taqîyê bitemirînin. Bo baldarî, çîranê xwe agadar biken ku ji ber zenga hişyarîya şaş gel agirîkûjê pêwendîyê negirin.



Alozî di kiryarrê

Eger di dezgahê da alozî derkeve, dikarin dîyarkera dokela RM 680110 pê pêlk kirina bişkovka taqîyê bitemirîne. Tê dengê pîpa kurt bê bihîstin û ronîya LED tê berdwam bibiriqe. Bêdeng kirina peyama şaşîyê tenê bo sê roja gengaze.

Paş sê caran temirandinê, bêçalak kirin tenê bo yek rojê gengaze.

Di maweya temirandinê da, çîraya LED berdwam di her 5 çirkeyan tê 1 car ronî biibe. Keremaxwe bo guhertina dezga bixebitin. Bo ev mebestê gel kompanîya rêveber/xwedîmalê xwe pêwendîyê bigirin.



Kontrola navberê

Eger zenga hişyarîyê bi sedema kontrola navberê deng bike, bo temirandinê dîyarkera dokela RM 680110 bişkovka taqîyê pêlk biken. Tê dengê pîpa kurt bê bihîstin û ronîya LED tê berdwam bibiriqe. Bêdeng kirina kontrola navberê tenê bo 3 roja gengaze. Hemû amûrên malê Heta navbera 50 cm ji dîyarkera dokelê çî

tişt ser rê nemîne. Di maweya temirandinê da, çîraya LED berdwam di her 30 çirkeyan tê 2 car ronî biibe.

Eger pêdivî bi guhertina dîyarkera dokela RM 680110 hebe gel kompanîya rêveber/xwedîmalê xwe pêwendîyê bigirin daku guhertin bi başî pêkwere



Naskirina cûdabûna ji soketê

Xênjî dema nûkirina malê, dîyarkera dokela RM 680110 – ji soketê neveqetînin.

Eger hûn nikarin dîyarkera dokelê bitemirînin, keremaxwe serdana beşa III biken. Şîretên ewlehiyê.



Taqîya piraktîkî

Pêlkkirina bişkovka taqîyê dibe sedem ku dîyarkera dokela RM 680110 taqîyek dîyarkera dokelê pêk bîne.

Agadarbin ku dezgah paş vê bo maweya 15 xûlekan tê temirî bîmîne. Di ev maweyê gengaziya lédana çî zengê hişyarîyê tune ye.

OK

Piraktîka Normal

Li maweya piraktîka normal da çî signal jî dîyarkera dokela RM 680110 belav nabe û çîraya LED ronî nabe.



III. Şîretên ewlehîyê

Pêvajoya dema nûkirin

- Dîyarkera dokelê neveqetînin RM 680110- xênjî dema nûkirin .
- Li maweya nûkirina avahîyekê, dezgahê veqetînin, dîyarker û eger pêwîst be pêpikê vê bikene nava kisikekê daku toz nekeve ser.
 - Royê dîyarkera dokela RM 680110pê reng, kaxez yan zeligok nepoşînin.
 - Pê veqetandina dezga ji soketê, qabê vê berevajî bizava dem-jîmêrê bizivîrînin û ji veqetînin.
 - Eger dîyarkera dokela RM 680110 bo maweya zêdetir ji du hefteyan dur ji soketê dur bimîne, tê sîgnalek (serdana nîgara "I. sîgnalên piraktîk û hişyarker di nêrînek ê da – naskirina cûdabûna ji soketê" biken). Paş lêdana dubareya soketê, sîgnal tê bê deng bibe. Heta ku neyê lêdan, bêdeng nabe.
- Paş dawîya nûkirinê **bilez dezgahê liser cihê pêşî** danên û pê givişandina bişkovka taqîyê, taqîyek piraktîk pêk bînin. Amadebûna piraktîk bi rêya piçkirina dîyarkera dokelê 680110 RM ser soketekê pêk tê.

Parastina navberê

- Amûrên wekî kabînet, perde, sîberkeran yan lampeyan **di nêzîkatîya kêmtir ji 50 cm** ji dîyarkera dokela RM 680110 nedanên.

Di mijarên jêr da rêveberîya avahîya xwe / xwedîmala xwe agadar bike:

- Sazkirina guhertinên bîngehî û guhertinan di bikaranîna yek bi yekê odeyan da.
- Eger odeya xwevê bê dabeşkirin yan cûdaker di odeya xwevê da bê nesb kirin yan dema ku binerê wek odeya xwevê yan odeya zarrok bê bikaranîn, çima ku vê demê pêdivî bi dîyarkera dokela RM 680110 ên bêtir hene.

Hinek babet liser bikaranîna cem penkeyê

Penke ser geryana dikelê dîyarkera dokela RM 680110 bandora nerênî dadinê û naskirina dokelê paş dext.

Pîla hatî xistin ser dezgah

Dîyarkera dokela RM 680110 neveken. Pîl liser dezga hatîye damezrandin û ne pêdivî bi çîgîrkirina vê ye.

Damezrandin divê ji aliyê pisporên rêpê dayî pêkbê

Serrastkirina dezga divê ji aliyê pisporê fermî pêkbê. Ev kesane dîyarkera dokela RM 680110 pê bikaranîna qetikên taybet bi damezrandinê (du gîre û du piç) ligel bestek du-kon ku cem dezgahê, hember DIN 14676 tê damezrandin.

Taybetmendî

- 1 Hestkerê feradeng bo kontrola navberê
- 2 Dergeha tîketina dokelê
- 3 Bişkovka taqîyê
- 4 Çiraya LED sor bo ragehandina hişyarîya nêrînî
- 5 Axafker bo ragehandina hişyarîya dengî
- 6 dîyode Infrared bo damezrandinê



IV. Taybetmendîyê teknîkî

- The Dîyarkera dokela RM 680110 ligor pîvana DIN EN 14604 berhev bûye û labela "Q" lisere. Pêdivîya ev babetê lêkolîna serkevtî ligor pêwîstîyên dijvarê VFDB [Civata Bilindkirina Parastin lihember Şiwata Elmanî] ¹ qeydbûyî di daxuyanîya 14-01.
- Naskirina dokelê pê şeweya belavkirina ronahîyê
- Pîla ser dezgah bi dirêjîya temenê 10 sala û şiyaf guhertinê.
- Çavdêrîya ser dergeha tîketina dokelê pê nîşankera Infrared
- Kontrola navbera feradeng – lêkolîna xwebera hebûna astengê di 50 cm, ku dibe sedema paşketina tîketina ronîyê.
- Xebata lêkolîna xwebera bi pergalf, lêkolîna xwebera dî ji bi rêya destî bi pêlk kirina bişkovka taqîyê di her demê da gengaze.
- Naskirina qirêjê û gengazîya sazkirina hestyarîyê.
- Gengazîya naskirina giêdayî nebûna dîyarkerê ji soketê.
- Giş peyam li dema şewê xênjî zenga hişyarîyê – paş dikevîne roja dî.

Dîyarkera dokela RM 680110 bo kesê neşareza kêrhatî nîne. Bo ev mebestê gel kompanîya rêveber/xwedîmalê xwe pêwendîyê bigirin.

¹VFDB [Civata Bilindkirina Parastin lihember Şiwata Elman]: Vereinigung zur Förderung des Deutschen Brandschutzes e.V. [Civata Bilindkirina Parastin lihember Şiwata Elman]

V. Dema şewatê divê çî bê kirin

A) Şewat di malê da



B) Şewat di pêlekana da



1772 0682
Atral Sekal GmbH
Schlangenbader Straße 40,
D-65344 Eltville, Europa
1772-Q-130592

EN 14604:2005
Diyarkera dokela RM 680110
Jimareya DoP : 1772-130592
Bikaranîn: Sistema Parastin li hember şewatê 1

Ev dezgaye ligor pêwîstiyên pêdivî û zagonên dî
yê taybet bi şîreta RT&T 1999/5/EC ne.

Ligor pêwîstiyên RoHS.

